PEAK DISTRICT NATIONAL PARK

**Hûn bi xêr hatine Hooks Carr-ê**
**Ku perçeyekî Axa Stanage/North Leesê ya Birêvebirîya Parkên Millî ye.**

**‘Mirîşka reş a çîyê – parastina hêlîneke taybet**
Gava hûn di biharê de hilkişîyan Stanage Edge-ê baş binihêrin, dibe hûn mirîşkeke reş a ne ji rêzê bibînin- lê her tişt wek xuya ye nîne.

Ring ouzel yan ‘mountain blackbird’ her sal ji Efrîqayê ber bi Stanage-North Lees Estate-ê ve di nava terkên kêleka kevirê sîlikê û derzan de ji bo çêkirina malekê geşteke ne ji rêzê dike.

Ouzel-a bi xelek a bi pîneya sipî ya sînga xwe û nêrî bi pirça xwe ya kêleka wî zîvî tê jihevderxistin, li Qiralîya Yekbûyî cûreke zozanî ye ku nifûsa wê kêm dibe.

Stanage-North Lees Estate li bakurê Îngîltereyê hê jî ji bo ouzel-ên rin cîhekî bivênevê ye, ji ber vê yekê her sal xwebexş, pisporên parastinê û koma hilkişînê di seranserê demsala zêdebûnê de ji bo alî parastina deverên hêlînçêkirinê bikin tên kêleka hev.

**Singêrên siriştê**
Çexerên zozanan ji bo siriştê hem hêlînek in û hem ji di kefteleftên têkoşîna bi guherîna îklîmê de depoyeke karbonê ya giring in.

Ev habîtat gava şil bin kar dikin, herweha tevlî çandinîya kevza Sphangum a ‘singêra gelek baş’ a jîngehê bi ‘girtina ber rêya çiranekan’ herikîna avê tê hêdîkirin û av tê girtin.

Maneya van hemû bizavan li zozanan, demeke dirêjtir berhevkirina avê ye ku ev jî li gundên me, bajarokên me û bajarên me ji bo kêmkirina tesîrên şîpê rêyeke giring e.

**Kûçik**
Ji bo çûkên li erdê hêlînê dikin û û heywanên din ên kûvî acis nebin bera hevsarê kûçikê we hebe.

**Derî**
Derî û zomaxên maqûl bi kar bînin. Derîyên we vekirî bigirin û ji nû ve kilît bikin.

**Gilêş**
Rêçê nehêlin. Ji bo gilêşê û bermayîyên sehî satila gilêşê bi kar bînin yan jî a baştir; gilêşa xwe bibin malê.

**Agir**
Ji agirê kempê û manqelê re destûr nayê dayîn. Seyran xweş e lê ji kerema xwe paqijîyê bikin û yên we anîye bibin malê.